Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî · Jimar : 1221 · 13-Mijdar-2024 · www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ · rojnameyaronahi · @ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com · Rojnameya Ronahî · +963 984 370 218

# Ji çîrokên dapîra xwe du berhemên bi wate amade kir

**Navenda Nûçeyan**



Zîlan Hemo nivîsandina çîrokên dapîra xwe li ser xwe weke erkekê dît û du berhem jê afirand.

Li Kantona Firatê di 3'yê Sibatê de ahenga îmzekirina 5 pirtûkan hate lidarxistin. Pirtûka nivîskar Zîlan Hemo ya bi navê ''Bi Şevê Tên Gotin'' jî di nava pirtûkan de cih girt ku pirtûka nîvîskarê ya duyem e. Zîlan Hemoyê derbarê îmzekirina pirtûka xwe de wiha got.

Nivîskar Zîlan Hemo got ku min girîngî bi wê yekê didît ku em xwedî li folklor û çîrokên xwe yên gelêrî derkevin. Çîrok in ku di navbera roja me û dîrokê de girêdanekê pêk tînin û got: "Ev pirtûka min a duyem e ku min berhev kiriye. Min di nivîsandina gelek pirtûkên hevbeş de cih girt ku yek ji wan jî pirtûka bi navê ''Çirûskek Ji Berxwedaniya Kobanê'' ye ku 10 nivîskaran bi hev re ev berhem amade kir. Her wiha pirtûka bi navê ''Rodî û Perwîn'' jî me berhev kir. Ji bilî van her du pirtûkan, pirtûka min a yekem a bi navê ''Bi Roj Nayên Gotin'' e ku ev pirtûk jî yek ji pirtûkên çîrokên gelêrî ye. Ev pirtûka min a duyem a bi navê ''Bi Şev Tên Gotin'' jî weke berdewamiya pirtûka min a yekem e" Zîlan Hemoyê di berdewamiya axaftina de got: "Cara yekem min di sala 2014'an de piştî ku min dest bi xwendina zimanê kurdî kir, min dest bi xwendina pirtûkan jî kir, piştre jî min dest bi nivîsandinê kir. Dema ku em di dersên folklorê de li ser mijara girîngî û berhevkirina berhemên gelêrî rawestiyan, min ew yek hîs kir ku divê em xwedî li folklora xwe derkevin."

**Bi rojê nayên gotin bi şevê tên gotin**

Zîlan Hemo diyar kir ku wê berhemên xwe bi giştî ji dapîra xwe girtine û ev yek wiha anî ziman: "Me şer, komkujî û êrîşên gelekî dijwar dîtin, heya ku em neçar man em koç bikin. Van karesatan jî bandoreke mezin li derûniya min kir ku min nekarî ez nivîsandinê berdewam bikim lê belê piştî demekê min dîsa dest bi nivîsandina çîrokan kir. Li rastî gelek astengiyan hatim lê belê dîsa jî min nivîsandina pirtûka xwe berdewam kir û gihand xwendekaran."

Zîlan got ku dema me dersên folklorê digirt di dersê de qala çîrokên ku dapîra min di zarokatiya min de ji min re digot, dihat kirin. Vê yekê gelekî bandor li min kir û min nivîsandina wan çîrokan ji bo xwe weke erkekê dît û Zîlan Hemo axaftina xwe wiha domand: "Di dersên folklorê de hemû caran heman tiştê dihat bîra min, ew jî zarokatiya min bû ku di sarmaya zivistanan de dapîr û bapîrê min bi şevê li ber çirayê û sobeyê ji me re çîrok digotin. Gava ez zarok bûm bapîrê min wefat kir lê belê dapîra min ji min re her tim çîrok digotin.Ez bi wê yekê gelekî kêfxweş dibûm. Dapîra min piştî hemû çîrokên xwe jî weke pendekê şîret li me dikir. Carna me bi roj jê dixwest ku ji me re çîrokan vebêje, wê jî digot; 'Bi roj nayê gotin, bi şevê tên gotin.'

Zîlan anî ziman ku divê em xwedî li wan kesên temenmezin derkevin ku li gel wan bi hezaran çîrok, gotinên pêşiyan û pend hene û divê wan pirtûkan jî ji xwendekaran û nifşê nû re diyar bikin û ev yek anîn ziman: "Em roj bi roj ew kesên ku weke pirekê di navbera dîrok û roja me ya îroyîn de ne ji dest didin. Ew zanist û gotin, pend, çîrok jî bi wan re dimirin. Divê em ji bo vê yekê zêdetir hewl bidin da ku em bikaribin çîrokên xwe yên gelêrî û folklora xwe zêdetir pêş bixin. Hewce ye beriya wefata wan em ew tiştên ku ew dizanin em tomar bikin û wan weke pirtûk binivîsînin. Ez bi xwe xwe gelekî bi şans hîs dikim ku min karî ez ji dapîra xwe wan çîrokên gelêrî tomar bikim û wan weke pirtûk biweşînim."

Zîlanê got ku ew ne tenê çîrokan dinivîse di heman demê de ew roman û helbestan jî dinivîse lê belê ew nivîsandina çîrokan li ser xwe weke erkekê dibîne ku divê ew wê yekê pêk bîne û wiha axivî: "Her tim metirsiya wefata kesên ku çîrokan, mamikan, dengbêjî û destanan dibêjin, li gel min heye. Ez jî nivîsaninda wan li ser xwe weke erkekê dibînim. Tu kes heta hetayê najî lê belê divê em li wêje û dîroka xwedî derkevin. Ez dizanim ku em nikarin hemûyan tomar bikin, berhev bikin û binivîsin lê belê bi qasî ji destê me tê em dê ji bo vê yekê hewl bidin da ku em bikaribin wêjeya xwe pêş bixin."

Zîlan Hemo di dawiyê de got ku divê her kes ku dengê ew kesên temenmezin tomar bike û piştre jî wan binivîse û Zîlan axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Kêfxweşiyeke mezin e ku nifşê nû bi zimanê xwe hebûna xwe îfade bike. Ji vî nifşî jî wê gelek nivîskar jê derkevin. Bi vî awayî wê zimanê kurdî û wêjeya wê jî pêş bikeve. Min heya niha bi tenê 52 çîrok ji dapîra xwe wergirtine. Lê belê dema ez kesên temenmezin dibînim, hema kurtejiyana wan, serpêhatî û zanînên wan ên gelêrî berhev dikim û wan dinivîsim."

# 'Periyên Havînê' yên Yamagata

**Navenda Nûçeyan**



**Hemû demsalên havînê daristanên li Japonyayê bi ronahiyên xweşik dibiriqin.**

Nexasim jî daristanên li herêma Yamagata bi ronahiya gûstêrk ango şevçirayan dibiriqin. Wênegirê bi navê Kazuaki Koseki wêneyên gûstêrkên ku daristanên Yamagata bi şewqa xwe ronî dikin girtine. Ji Japonyayê ji gûstêrkan re "genji botaru" tê gotin û gava demsal dibe havîn xelk berê xwe didin daristanan da ku menzereyên xweşik ên daristanê bibînin.

Kazuaki Koseki van wêneyên ku girtine di koleksiyona xwe ya bi navê "Summer Faeries" (Periyên Havînê) de kom kiriye. Ji xwe mala wî jî nêzî daristanê ye û gelek caran tevî malbata xwe diçe serdana daristanê da ku menzereyên bêhempa bibîn û wêneyên van deverên ciwan bigire.

Kazuaki Koseki ji bo wêneyên xwe dibêje; "Gûstêrkên ku li daristanên Japonyayê digerin taybet in. Hin ji van gûstêrkan tenê li Japonyayê dijîn. Gava ew di nav daristanê de dibiriqin çawa ku mirov li stêrkên li asîman dibiriqin dinihêre, ewqasî ku xweşik tên xuyanê. Ev dîmenên xweşik tenê 10-15 rojan dewam dikin û piştî demekê gûstêrk winda dibin. Ji lewma bihûrîna wext jî bi me didin hîs kirin."

Kazuaki Koseki di derbarê gûstêrkan de agahiyekey bi vî rengî jî dide; gûstêrkên ku min wêneyên wan girtiye hemû yên nêr û mezin in. Ew ronahiyê digerînin û digihîjînin gûstêrkên din. Ji ber ku perên gûstêrkên mê dişkên ew nikarin bifirin!

**bi kamîreya ronahî**



# FERHENGA BIWÊJAN

**Şekala xwe bi şûn ve xişikand/ şekala xwe bi şûn ve dixişikîne:**
- Xwest kar dereng bihêle; xwest kar zû neyê kirin; xwest kar li paş bixe.

**Tu dibêjî qey nanê garisî dixwe:**
- Ji bo kesê bê dilê xwe kar dike tê gotin.

**Barê xwe danî:**
- Za; zarok jê re bû.

**Bi serê xwe ye:**
- Di dema xwe de hatiye dinyayê; rojên wê qediyane.

**Li ser destan e:**
- Ketiye ser destan; dema wê ya zayînê hatiye.

**Ajotin pêş:**
- Dan pêş; xistin nûnerê xwe; kirin berdevikê xwe.
*Ji bo ku rêberiyê ji wan re bike gundiyan A... ajot pêş.
*Ji bo ku tiştek bi wan neyê, ti zererê nebînin gundiyan A... ajot pêş.

**Barê wî girt ser xwe:**
- Debara wî girt ser xwe; xwedîkirina wî girt ser xwe;
- Berpirsiyariya wî girt ser xwe; got ezê pirsgirêkên wî çareser bikim.

**Barê wî lê kir:**
- Erkê wî nîşan da; karê wî da pêşiyê; ka pêwîst e çi bike jê re got.

**Deynê stûyê me ye:**
- Em mecbûr in bikin; erkê me ye.

**Diavêje ser:**
-Dixwaze bi wî bide kirin.

**Diavêjin ser hev:**
- Her yek dixwaze bi yê din bide kirin.

**Ji melê bangdan:**
- Min erkê xwe pêk anî, eger hevalên min erkê xwe pêk neanîbin ne sûcê min e.

**Ji stûyê xwe deranî/ji stûyê xwe derxist:**
- Kir; wezîfeya xwe kir; tişta jê hatî xwestin kir.

**Ket bin bar:**
- Êdî karê malê maye bi hêviya wî ve.

**Kîso hêkên xwe dixe bin axê û dibeje, eger ji Xwedê re divê wê çêlîkan derxe:**
- Ji bo kesê erkê xwe pêk tîne tê gotin.

**Xwe da ber barê wî:**
- Debara wî girt ser xwe; xwedîkirina wî girt ser xwe;
- Berpirsiyariya wî girt ser xwe; got ezê pirsgirêkên wî çareser bikim.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## Desthilata AKP-MHP'ê dixwaze bi qirkirina siyasî îradeya gel desteser bike



Parlementera DEM Partî ya Mêrdînê Salîha Aydenîz diyar kir ku rêbazê bikaranîna qeyûman binpêkirina mafên hiqûqî ye û wiha got: "Bi tayînkirina qeyûman neçareserkirina pirsgirêka kurd kûr û dûr dikin."**R-5**

## Agirê sînemeyê hîn jî dilê kurdan disojîne



Şewata sînema Amûdê yek ji bûyerên herî bi êş di dîroka kurdan de ye ku di encamê de zêdeyî 200 zarokên kurd jiyana xwe ji dest dan. Şahidê bûyerê ku wê demê li sînemeyê hazir bû Mihemed Ebdulselam diyar kir ku dîmenên şewata hevalên wî ji mejiyê wî dernayê.**R-7**


Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî · Jimar : 1221 · 13-Mijdar-2024 · www.ronahi.net/ku/ · Nirx: 500 L.S

## Perensîb û binesaziya Kongra Star...(2)




Kongra Star rêxistineke taybet ji bo jinan e. Li ser felsefeya Neteweya Demokratîk û ramanên Rêber Apo di qadên civakî, bîrdozî, siyasî, leşkerî û hwd… xebateke bêhempa dide meşandin. Herwiha Kongra Star, bi vîn û hêza jinên azadîxwaz hertim xwe di nava civakê de bi rêxistin dike û hewleke mezin dide ku azadiya jinan bi dest bixe. **R-2**

## Seyid Riza; Ez bawer im ku wê Kurd û Kurdistan bi serbikevin



Beriya darvekirinê gotina Seyid Riza ya dawî ev bû: "Min nikarîbû bi derewên we re mijûl bibim, bila ev ji min re bibe derd, lê min jî, serî li ber we netewand, bila ev ji we re bibe derd."**R-6**

# ŞENGAL JI FERMANÊ BER BI XWESERIYA DEMOKRATÎK VE

Di 3'yê Tebaxa sala 2014'an de, çeteyên DAIŞ'ê Şengal dagir kirin, bi hezaran Êzidî qetil kirin û bi hezaran jin û zarok jî revandin. Gerîlayên HPG-YJA Star, ciwanên xwebexş yên Êzidî û bi hevkariya YPG-YPJ'ê di 13'yê Mijdara 2015'an de Şengal ji çeteyên DAIŞ'ê rizgar kirin. Piştî rizgarkirina Şengalê, civaka Êzidî û gelên Şengalê xwe ji qirkirin û fermanê rizgar kirin, zincîrên koletiyê şikandin û ji bo Şengala xweser û azad gavên mezin avêtin.**R-4**



## Kampa Holê; Xeteriya jinûvezindîkirina hişmendiya DAIŞ'ê



Piştî têkçûna çeteyên DAIŞ'ê, bi hezaran malabatên çeteyan li Kampa Holê hatin bicihkirin, lewra ev kamp bû kampa herî xeternak ya cîhanê. Ji ber wê QSD, YPJ û Hêzên Ewlekariya Hundrîn li dijî vê xeteriyê operasyonên elehiyê li dar dixin. Herî dawî jî di 5'ê Mijdara 2024'an pêngava bi navê 'Ewlehiya Domdar' hat lidarxistin. **R-3**

Têkoşîna ji bo hebûnê, rûmet e
Nehîr pale R-2


Hilbijartinên Amerîka zêde bandorê li herêmê nake!
Dilyar Cizîrî R-4


Galegalên binî pûç
Farûk Sakik R-5

Trump ji bona Erdogan deriyê şer e...
Zekî Bedran R-5


Sîwaneke rewşenbîrî lê lihevkirin û hevpejirandin..?
Kemal Necim R-7

# Perensîb û binesaziya Kongra Star...(2)

Kongra Star rêxistineke taybet ji bo jinan e. Li ser felsefeya Neteweya Demokratîk û ramanên Rêber Apo di qadên civakî, bîrdozî, siyasî, leşkerî û hwd… xebateke bêhempa dide meşandin. Herwiha Kongra Star, bi vîn û hêza jinên azadîxwaz hertim xwe di nava civakê de bi rêxistin dike û hewleke mezin dide ku azadiya jinan bi dest bixe.

**Navenda Nûçeyan**

Di tevahiya qadên weke bîrdozî, civakî, siyasî, xweparastin, tenduristî, perwerde, çand, dîplomasî û hwd... de xwe bi rêxistin dike û têdikoşe. Ew beşdariya demokratîk a cihêreng ku cudahiyan digire nava xwe, dipejirîne. Di biryaran de bawerî û hevparbûn esas digire. Her wiha pêkanîna xwesertiya her rêxistin û saziyê li ber çavan tê girtin. Di tevahiya qad û komîteyên Kongra Star de rêveberî bi hilbijartinê tê ser kar. Beriya dema kifşkirî, di rewşeke ku ji erkgirtin û guhertin pêwîst dike de, ji aliyê rêveberiya rêxistina jinê ya têkildar û rêveberiya Kongra Star ve sazî tê çêkirin. Di neçariyê de bi rêbaza tayînkirinê ango destnîşankirin, erkdarkirin pêk tê. Rêxistina Kongra Star di mekanîzmeya xebata xwe de rêgeza aşkereyî (elaniyetê) esas digire. Ji ber vê yekê jî li ser bingehê komun, meclis, akademî, koperatîf û komîteyan xwe bi rêxistin dike. Di tevahiya sazî, komîte û rêxistina giştî de nûnertiya wekhev û pergala hevserokatiyê esas digire. Di rêxistin û saziyên jinan de bi tevlîbûna kes û nasnameyên hikmî/hiqûqî di tevahiya qadên civakê de weke rêxistinbûna sîwanî ya konfederal bi rêxistin dibe. Her rêxistinek, komele, komîte, rêxistineke civaka sivîl a jinan û rêxistinên jinan ên partiyên siyasî û hwd… yên ku hevpeymanê dipejirînin, dikarin bibin endam. Her rêxistinek xwesertiya xwe diparêze û di mijarên weke birêxistinbûn, berpirsyariya beranberî hev, xebat û biryaran de hevparbûn esas tê girtin.

**Binesazî û mekanîzmeya rêxistinî ya Kongra Star:**

Kongra Star li ser çar qadan, mekanîzmeya xebatê dide meşandin yek jê li ser bingeha li darxistina kongreyan. Li aliyekî din bi riya kordînasiyon û meclisan di nav re jî avabûna rêveberiya Kongra Star karê rojane dike. Dezgeha biryarê ya herî jor a Kongra Star, kongre ye û du salan carekê tê lidarxistin. Di tevahiya qadên xebatê de bi tevlîbûna hejmareke pêwîst a nûneran kongre pêk tê. Delege li gorî asta rêxistinbûna kanton, komîte û rêxistinan tên diyarkirin. Xebatên giştî yên du salan ên Kongra Starê tê nirxandin, pêşniyarên guhertina hevpeymanê tê destgirtin û xeta bîrdozîk-polîtîk tê biryardayîn her wiha ji bo du salan plansazî tê aşkerekirin. Ji bo ku xebatên du salan bimeşînin nûnerên hilbijartî yên kanton, komîte û rêxistinan ên ku di konferansan de hatine hilbijartin, weke endamên meclîsê, Kongra Star wan qebûl dike û bi wî şêwazê meclîsa xwe diyar dike. Di kongreyê de endamên kordînasyonê ku ji 5 an jî 7 kesan pêk tê, tên hilbijartin. Ew kordînasyon bi berdevkên komîteyan re rêveberiya Kongra Star pêk tînin.

**Kordînasyona Kongra Star**

Kordînasyona di navbera komîte û rêxistinan de pêk tîne, di biryaran de li gorî rêgezên demokratîk hevparbûn û li ser bingehê karbeşiyê birêxistinbûnê esas digire. Li hemberî meclis û rêveberiya Kongra Star berpirsiyar e. Xebatên tevahiya rêxistin, şax û komîteyan dişopîne, perspektîf pêşkêş dike û vedinêre. Di nava xwe de berdevka xwe dide diyar kirin. Rêxistinbûn û saziyên ku pêwîst dibîne pêş dixe. Desteya Displîn; dispilîn parçeyeke ji sîstema civakî, rêxistinî û rêxistinkirina têkilyên di navbera andam, rêveberî, kar,sazî an jî rêxistinan ji bo vê yekê komîteya disiplînê kar û xebatên pêwîst dide meşandin û bi awayê perwrdekirin û fêrkirinê li ser esasê rêz girtin û bi hevre karkirin, parastina nirxan û bi endam, rêveber û kesên aleqedare dixebite û dema pêwîstbe li gorî rêziknameya xwe mudaxeleyên tên xwestin dike.

**Meclisa Kongra Star**

Ji herêm, kanton, komîte û ji rêxistinên jinan ên xebatên giştî dimeşînin û ji nûnerên jinên Ciwan pêk tê. Her nûnerek di cih, komîte û rêxistina xwe de weke hilbijartî tê kongreyê û bi wî awayî nûnertiya xwe di meclîsê de dibîne. Berpirsiyara cîbicîkirina biryarên ku di kongrê de hatine girtin û plansaziyên ku tên xuyakirin. Her wiha ji bo mijarên gelekî pêwîst, komîsyonên mayînde û demkî ava dike. Berpirsyara amadekirina civînin asayî û awarte yên kongreyê ye. Meclis, mehê carekê civînên xwe li dar dixe, bi awayekê giştî xebatên xwe dike, plansazî û perspektîfên mehane pêşdixe. Pê re jî civînên xwe yên nîvsalane û salane jî weke periyodîk pêk tîne, xebatan bi awayekî berfireh digire dest û hevpar dike, hem jî biryar û planên nû amede dike. Meclis, li ser daxwaza endamên meclisê an jî di rewşên ku kordînasyon pêwîst dibîne de, bi awayek awarte kom dibe.

**Rêveberiya Kongra Star**

Rêveberiya Kongra Star ji berdevkên komîteyan, nûnerên Jinên Ciwan û endamên kordînasyonê pêk tê. Rêveberiya Kongra Star her 15 rojan carekê civîna xwe li dar dixe, xebatan dinirxîne, biryar û plansaziyên hevpar pêşdixe. Di heman demê de li pêşdariya Meclisa Kongra Star berpirsyar e. Lewma jî xebatên




piratîk ên tên meşandin ji nêz ve dişopîne, venêrîn dike û di derbarê meşandina xebatan de perspektîfên rojane dide.

**Darazên (hikmên) giştî**

Kongra Star, xwe di pêşxistina pergala Rêveberiya Xweser de berpirsyar dibîne. Di înşaya civakî ya her qadekê wê pergalê li gorî rêgeza nûnertiya wekhev erka xwe ya pêşengtiyê pêk tîne. Kongra Star, têkiliya xwe ya bi Rêveberiya Xweser re li ser Desteya Jin pêşdixe. Di tevahiya qadên giştî yên xebatê de vîna biryargirtina jinê, ya jinê bixwe ye. Her yekîneyekê rêxistinê di her mijarekê ku jinê eleqedar dike de nûnera jin muxatab digire, di biryarên di derbarê jinê de hevpar dibe. Kongra Star YPJ'ê weke rêxistina parastina jin dipejirîne û xwe di hêzkirin û mezinkirina YPJ'ê de berpirsyar dibîne. Kongra Star, Jinên Ciwan weke hêza guherîn, çalak û pêşeng a civakê dibîne, li ser vê bingehê; li gorî berpirsyariya beramberî hev tevdigere, meşandina têkoşîn û xebata hevpareyî esas digire. Kongra Star, bi rêveberiyên xwecihî yên ekolojîk re ku qadên bingehîn ên pergala konfederasyona demokratîk û veguherîna civakî ne, li ser hişmendiya hevdû temamkirinê têkilyan pêşdixe, xebat û projeyên hevpar dimeşîne. Kongra Star, hevpeymanên jin ên navnetewî dipejirîne û xwe di pêkanîna wan hevpeymanan de berpirsiyar dibîne.

# 'Mala Jin ji pirsgirêkên jinan re dibe bersiv'

**Yasmîn Omo /Hesekê**

**Hevseroka mala jinê Lamiya Mihemed diyar kir ku di mala jin ya bajarê Hesekê de jin ji hemû pêkhatiyan cihê xse digirin û di çaresrkirina pirsgirêkên jinan de roleke girîng dilîzin.**

Jinên Rojavayê Kurdistanê di sala 2004'an de bi pêşengiya Yekitiya Star dikaribûn xwe bi rêxistin bikin. Piştî şoreşa 19'ê Tîrmehê ev gav pêşve çûn û jin dikaribûn gelek sazî, dezgeh û rêxistinên jinan ava bikin. Yek ji wan saziyan Mala Jin e ku dikaribû bibe dengê jinên rastî zehmetiyan tên. Mala Jin di 20'ê Adara 2011'an de xwe yekem car li bajarê Qamişloyê bi rêxistin dike. Di Mala Jin de hemû endam ji dayikan pêk tên û ev dayik dema jin rastî pirsgirêk û zordestiyê



dihatin, dikaribûn çareser bikin û bibin dengê wan. Ji bo ku em zêdetir kar û xebatên Mala Jin binasin hewceyê lêkolîn û guhdarîkirina kesên ku tê de kar û xebat meşandine hebû.
Derbarê kar û xebatên Mala jin a bajarê Hesekê, rêveberiya wê Lamiya Mihemed ji Rojnameya me re axivî.
Lamiya Mihemed di destpêka axftina xwe wiha got: "Piştî avabûna mala jinê li bajarê Hesekê jinên ji pêkhateyên cuda cihê xwe girtin û xebatê didin meşandin. Pi taybet pirsgirêkên jinan tên çareserkirin. Karê me li gorî zagona Rêveberiya Xweser hatiye diyarkirin'. Ji xwe bûyerên herî berbiçav ên ku dighêjin me û yên ku di nav civakê de belavbûye, bi piranî ji ber zewaca temenbiçûk e. Pirsgirêkên tên gel me; şidet, pirzewacî û zewaca temenbiçûk û hwd. Li cem me mafê tevahiya endamên malpatê parastiye."
Lamiya axaftina derbarê mekanîzmeya kar û xebatên mala jin de wiha got: "Li 22 bajar û bajarokan komîteyên me yên dadweriyê hene û ew girêdayî Hesekê ne. Armanca komîteyên me belavkirina hişyariyê û çareserkirina dozê têkildarî jinan e. wekî dozên destdirêjiya mêr, kevneşpiyên civakî yên derheqê jinê de, çewisandin û bêmafhiştina ji mafê mîras. Ji ber zihniyeta mêr jin li tevahiya herêmê rastî çewisandinê tê. Wekî mala jin jî hewil dide çareseriyekê guncaw ji van pirsgirêkan re bibînne. Bêyî ku zerar bighêje tu kesî ji malbatê."
Rêvebera Mala Jin a bajarê Hesekê Lamiya Mihemed balkişand ser hejmarê dozên ku hatine ji wan re û axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Hejmara dozên di asta saziyê de dighêje 200 'î , piraniya wan dozan nakokiyên zewacê ne , dozên weke lêdan, tûndî , pirzewacî û zewaca temenbiçûk de sewqî Dozgeriya komarê tên kirin, ev nakokî derbasî dadmendiyê dibin ji ber ku çareserî jêre tune, li dadmendyê jî piraniya wan bi li hevhatinê tên çareserkirin . Tevî hemû zehmetiyan ku di destpêkê de derket pêş, lê niha civakê rola jinê wekî ya mêr çi mêr qebûl kiriye. ''

## Ji Pênûsa Jin

### Têkoşîna ji bo hebûnê, rûmet e

**Nehîr Pale**

Sîstema baviksalarî bi rê û rêbazên cuda di mejiyê zayendeperestan de ferasetên kûr dane çandin. Di encama wan ferasetan de li ser jinê tûndiyeke dijwar tê kirin. Li beramberî tûndiya mêr li ser jinê dide meşandin bertek ji aliyê civakê ve dernakeve. Jin jî ji ber zexta li ser wê hebûna xwe weke jin înkar dike yan jî koletiyê li ser xwe dipejirîn e.
Hebûna jinê çawa tê înkar kirin? Jin çênabe ku derbasî ciyên pîroz bibe, ciyê ku mêr lê heye nabe ku jin li wêderê hebe, di şîn û şahiyan de wê jin li quncikan bin, çênabe ku kesek wan bibîne. Dema ku jin derbikevin derve divê heyanî riwê wan xuya neke û misoger mêrek pêre hebe. Hinek mêr hene ji xwe destûr nadin ku hevjîn û keçên wan bi temamî derbasî ciyê qerebalix lê hebe, bibin. Gelek lewaziyên jin jî hene ku li beramberî van rêbazan bêdeng bimîne. Êdî civakê bi jinê daye qebûlkirin ku ew bê mêr nikarin bijîn û divê bi alîkariya mêr jiyana xwe berdewam bikin.
Rêber Apo yê yekemîn e ku li hemberî vê yekê derket, qebûlnekir ku mêr serdestiya xwe li ser jinê berdewam bike û li hemberî hişmendiya mêr a ku her tim jinê kole dibîne dest bi şoreşê kir. Ji ber vê yekê di avakirina artêş û tevgerên jin de giringî da têkoşîna hebûnê. Têkoşîna hebûnê kî destpêkir? Jinên şoreşger û têkoşînvan.
Dîroka têkoşînê ya hebûna jinê gelekî kûr e û bi hezaran jin di vê têkoşînê de xwe feda kirin. Jin li hemberî zayendeperestiyê riya siyemîn hilbijartin, ne li malbata ku wan difetisîne bimînin û ne jî bibin mulkê mêr, lê belê tevlî Tevgera Azadiyê bûn. Jinên ku xwendin li ser wan hatibû qedexe kirin, nikarîbûn ji malê derbikevin berpirsyartiya rizgarkirina welat rakirin û berê xwe dan ciyê ku hebûna xwe lê ava bikin. Jinên ku zanîngeh bi dawî kiribûn, ên zewicî bûn û yên zarokên wan hebûn Tevgera Azadiyê ciyê xwe dîtin. Her tiştê ku civaka zayendperest karê jinê nedidît fêr bûn. Tevlî şer bûn, bûn fermandar û ciyê xwe di hemû xebatan de girtin.
Piştî têkoşîna jinên şoreşger êdî dengê jinê tê bihîstin. Her ku xebatên jin berfereh dibin hebûna wê diyar dibe. Hemû teoriyên ku dibêjin jin lewaze, nikare bibe hêza parastinê, guhertin û pêşxistinê vala têne derxistin. Jinê dest bi pêvajoya ku divê teoriya Platon a ku dibêje `Jin mêrê kêm e` were tine kirin, hinek gotinên ol ku dibêjin: `Jin ji parsuyê mêr çêbûye` werin guhertin. Têkoşîna hebûnê tê kirin û zîhniyeta mêr ê were guhertin. Jiyana ku em hêvî dikin şer lê nebe, edalet li pêşbe, her kes berpirsyartî rabike bi hevre bibin alîkar, bi keda xwe bijîn, di têkiliya civakî de hezkirin û rêzdarî hebe, wê jin ava bike. Bi hebûna jinê re hemû pirsgirêkên civakî yên temenê wan bûye 5 hezar sal ê werin çareser kirin.
Ji bo em bighîjin vê yekê şerte ku em pêdiviya rêxistinkirine, berxwedan û têkoşînê hîs bikin û daxwaza hebûna xwe bikin.



# Agirê sînemeyê hîn jî dilê kurdan disojîne

Şewata sînema Amûdê yek ji bûyerên herî bi êş di dîroka kurdan de ye ku di encamê de zêdeyî 200 zarokên kurd jiyana xwe ji dest dan.


Şahidê bûyerê ku wê demê li sînemeyê hazir bû Mihemed Ebdulselam diyar kir ku dîmenên şewata hevalên wî ji mejiyê wî dernayê.

**Dilovan Kêfo/Amûdê**

Di 13'ê Mijdara 1960'î de, bajarê Amûdê yê Rojavayê Kurdistanê bû şahidê kuştina zêdetir ji 200 kesî ku piraniya wan zarokên dibistanê bûn.

**Kêliyên destpêkê yên şewata Sînemeya Amûdê**

Ji bo pişgiriya Şoreşa Cezarê ya li dijî firansiyan, li Sînemeya Şarezad ya bajarê Amûdê filimê bi navê 'Reşa nîvê şevê' hat pêşandan, qaşo wê bi nirxê pilêtan piştgirya Cezayirê bikin. BI zorê xundekarên dibistana Seretayî ya El-Xezalî birin sînemayê. Temenê xwendekaran jî ne zêdiyî 12 salî bûn. Di dema pêşandanê de agir bi sînemayê ket û tê gotin ku çirûskek ji motorê derketiye û banê dar û kaş, dîwarên darîn û kursî zû şewitîn, ango her tişt tê de ji bo şewitandina bilez amade bû. Tiştê ku meselê dijwartir dikir



qelebalixa mezin a zarokan bû, herwiha tenê dergehek hebû, ku ji ber qerebalixa zêde hat girtin û deriyê darê bilind li ser erdê girtî bû, ku zarok di hundir de asê mabûn. Xelkê bajêr qîrîna zarokan bihîstin û ji bo alîkariyê beziyan.

**Yek ji sombolên sînemeyê Mihemedê Seîdê Deqorî**

Yek ji lehengên vê bûyerê Mihemedê Seîd Axayê Deqorî bû ku bû xelaskerê gelek zarokan bû. Wî bi dehan zarokan derdixe û xilas dike. Di dawiyê de stûnek di ser de hat xwarê û canê xwe ji dest da. Zarokên kû sax mane, hîn jî şopên şewatê li ser laşê wan hene. Agirê Sînemaya bajarê Amûdê jî wek semboleke zilm û neheqiya li gelê kurd hîn jî her sal tê bibîranîn.

**'Agirê sînemayê hîn jî dilê min disoje'**

Yek ji şahidê bûyerê ku di dema şewata sînemeyê de di nava zarokan de û ew kêlî jiyan kiriye welatiyê bi navê Mihemed Emîn Ebdselam ji Rojnameya me re axivî.
Mihemed Ebdselam bîranîna xwe ya herî bi êş wiha anî ziman: "Rêveberiya dibistana me ya ku wê demê navê wê El-Xezalî bû, ji me re got her yek ji we pereyan bi xwer bînin û tevlî temaşekirina fîlim li sînemayê bibin. Ji me re got ku ewê bi van pereyên me piştgiriya şoreşa Cezayir ya li dijî Firansiyan bikin. Em zarokên dibistanê gelekî kêf xweş bûn û me çilên xwe yên xweşik li xwe kirin ji ber ku em ê cara yekê herin sînemayê, lê belê mixabin me nizanî bû ku çûyîna me wê bibe karîsetek mezin. Di dema me li fîlim temaşe dikr agir û dûmaneke mezin rû da, pê re qîrîn û qerebalxa zarokan bilind bû. Sîneme bi giştî şewitî , di encamê gelek zarok şewitîn, hin ji ber dûmanê û dehfdanê fetisîn. "

**'Zarokên Amûdê bûn kulîlikên buhişta Yezdan'**

Mûhemed Emîn Ebdselam axaftina xwe wiha qedand: "Peyv tûne ye ku hestên di dilê min de şîrove bike û bêje. Ger ew zarokên hatin şewtandin, di roja me ya îro de saxbana; wê bajarê Amûdê pir zêdetir ji niha cuda ba. Lê ew bûn kulîlikên buhişta yezdan."

# Rêvan Ibrahîm evîndarê tembûrê û muzîka filiklorî ye

**Hemza Sêvo/Qamişlo**

**Rêvan Ibrahîm welatiyekî efrînî ye bi temenê xwe 60 salî ye. Ew ji 7 saliya xwe ve rahiştiye tembûrê, wî bi saza xwe awazên şoreşgerî û netewperwerî jenandin. Di heman demê de ji ber evîna çand û hunera kurdî, muzîka kevnar a kurdî parastiye.**

Rast e tembûr alaveke muzîkjeniyê ye, lê ji bo gelê kurd weke perçekî netewî ye ji gewdê kurdan tê hesbandin. Di dîroka kurdan de pêre jî di hemdemiya vê civakê de hezkirina tembûrê cihekî mezin di dilê kurdan de heye. Eger ne bi dehan tembûrjenên kurd hebin wê bi sedan hilgir û sazjenên kurd di roja îro de hebin ji van muzîkjenan jî Wehîd Ibrahîm e. Derbarê jiyan û hunera Wedîd de, ew ji rojnameya me re axivî.

**Jidayîkbûn, xwendina Ibrahîm**

Wehîd Ibrahîm girêdayî jidayîkbûn û xwendina xwe wiha got: " Ez Wehîd Ibrahîm im, Rêvan jî navê min î hunerî ye. Di sala 1965'an de li gundê Çeqelê Cûmê yê girêdayî navçeya Cindrêsê, li Efrînê ji dayîk bûme. Di wê demê de jiyana min wekî her mirovekî ku li gundan bijî, derbas bû. Min xwendina xwe ya seretayî li gundê Miska Jorîn û gundê Çeqelê Cûmê temam kiriye. Herwiha li Efrîn û Cindirêsê jî xwendina navîn qedandiye. Ji ber hunera muzîkjeniyê, ez neçar bûm ku xwendina xwe nedomînim. Piştî temenê min bû 18 sal, min karê leşkerî yê rêjîma Beisê kir. Di wê demê de



bi riya zabitekî leşkerî, min Tevgera Azadiyê nas kir. Ew zabit ji Efrînê bû, wî pirtûka Berxwedan Jiyan a Mezlûm Doxan da min. Ev yek jî di sala 1985'an de bû. Piştî ku min karê leşkerî kir ez tevlî komên hunerî yên şoreşgerî bûm. Di salên 1990'î de jî min firoşgeheke amûrên muzîkê û amûrên teknîka muzîkê li Helebê vekir."

**Fêrbûna jenandina tembûrê, pê re jî hunerên cuda**

Ibrahîm çîroka fêrbûna tembûrjeniyê wiha vegot: "Di zaroktiya xwe de min gelekî ji hunerê hez dikir. Dema ku ez zarok bûm birayekî min, tembûr dijenand, ez jî bi baldarî li pêşiya wî rûdiniştim, lê temaşe û guhdar dikir. Lêdana tembûrê ji bo min tiştekî gelekî balkêş bû û hertim xwesteka fêrbûnê li pêş bû. Rojekê ji rojan birayê min wisa li tembûrê dida, piştî çend seetan ji mal derket, êdî min tembûr weke yekem car bi destê xwe hilgirt û jenand. Hîna jî meqamê ku min wê demê tembûr li ser jenand, di bala min de ye. Piştî wê bi du salan, min bi temenê 7 salî bi bisporî tembûr jenand. Ji destpêka ku min rahiştiye tembûrê heta roja îro jî, ez neçûme gel ti kesan û xwe fêrî tembûrê nekiriye. Lê belê min xwe fêr kir û ez bi hunermendan re derketim şevbuhêrk, zemawend û şahiyên civakî. Li gel muzîkjeniyê jî, min gotinên gelek stranan nivîsandine û di komên me yên hunerî de hatine gotin herwiha jî ez wênesaz, peykersaz û şanonivîs im."

**Xebata hunera şoreşgerî**

Rêvan têkildarî xebata di nav komên hunerî de wisa axivî: "Dema ku min leşkeriya rêjîmê bi dawî kir, bi fermî min dest bi xebata hunerî ya şoreşgerî kir. Di sala 1989'an de, me 4 kesan li Efrînê Koma Ararat damezirand. Piştî salekê, dîsa me li Efrînê komeke hunerî bi navê Engîzek ava kir pê re jî em bi awayekî rojane derketin şahiyên civakî, hem jî yên netewî. Di heman demê de komeke hunerî li ser asta Rojava tevî hate damezirandin. Em weke koma Engîzek di sala 1990'î de salvegera damezrandina PKK'ê de çûn Lubnanê. Me li wir çalakiyeke hunerî li dar xist, şensê herî mezin bû ji bo min ku Rêber Apo li wê şahiyê dît. Ew xwedî karîzmayeke gelekî bi heybet bû, min qet nedikarîbû li çavên wî binerim ji ber hêzdarî û heybeta wî. Me çalakî li dar xist û zivirîn Efrînê. Di wan salan de em weke komên hunerî li Efrînê pêrgî gelek zor û zehmetiyan dihatin, me perwerdeyên xwe bi awyekî veşartî li malan dida meşandin. Ev yek wiha berdewam kir, heyanî destpêkirina komploya li ser Rêber Abdullah Ocalan. Sedem ew bû ku rêjîmê zexta li ser tevgera siyasî û hunerî dijwartir kir. Bi destpêkirina şoreşa Rojava re, ez û malbata xwe tevî dest bi xebata şoreşgerî kir, ez bi taybet tevlî milê hunerî bûm. Lewma jî ez bûm rêveberê Navenda Çandê ya Cindrêsê û tê de jî me xebateke hunerî pir mezin da meşandin. Piştî ku Efrîn hate dagirkirin, ez hatim Şehbayê û ketim nav Komîteya Kelepûrê, me bi hevre berhemên folklorî ya wê herêmê kom kir. Piştî wê jî ez tevlî Koma Kevneşopî bûm û heya berî du mehan tê de xebat dikir."

**Cêwaziya tembûrjeniya wî ji ya muzîkjenên din**

Muzîkjen Wehdîd Ibrahîm di derbarê huner û berhemên xwe de wiha dest nîşan kir: "Awazên ku min çêkirine piraniya xwe, oktevek û nîv in, kêm caran min awazên oktevek çêkirine. Ji destpêka perdeya yekem heya dawiya perdeya tembûrê gelek meqam hene, eger ez awazekê çêbikim, dê li ser oktîv û nîvê bi gelek meqamên cêwaz awazekê biafrînim. Piraniya muzîkjenên din, di be ku şahiyekê tevî li ser du meqaman derbas bikin. Muzîkjenên ku mîna min awazan bi oktev û nîvê çêdikin ne kêm in, ez xwe nabînim muzîkjenekî nimûneyî û zane, ji ber ku huner deriyayeke mezin e. Min gelek muzîk bi şêwazê xwe çêkirine, weke Semfûniyet Elelem, Buheyret Elwecee û hwd.. . Piraniya awazên ku min afrandine jî bi êş û xemgîn in, ew jî êşa gelê kurd û welatê me ye. Lê mixabin heya niha ji ber rewşa madî min awazên xwe tomar nekirine. Lê wekî din tenê beriya çend rojan min û Hunergeha Welat nêzî 30 awazên folklorî li hunergehê tomar kir.

## Têbînî



### Sîwaneke rewşenbîrî lê lihevkirin û hevpejirandin..?


**Kemal Necim**

Li Rojava û Sûriyê bi salan kar û xebat û çalakiyên rewşenbîrî û çandî di bin siya çewisandin û qedexeyê de birêve diçûn, lewma bi ti awayî derfeta vê beşê civakê çênebû ku di bin siya sazî yan dezgehekê de xwe birêxisitn bike. Eger carna hin sazî û dezgeh hatin avakirin jî bi dizî û veşartî bûn yan jî li derveyî welat bûn.
Piştî pêvajoya şoreşê weke hemû qadên din ê jiyanê di qada sazîbûn û rêxistinbûna civaka rewşenbîran de derfet pêk hatin. Lê di demeke kurt de çend saziyên ku bi kar û barên rewşenbîran mijûl dibin hatin avakirin, weke kevneşopiyekê, ev sazî jî di bin bandora bîr û boçûnên siyasî û bîrdozî ji hev cuda bûn, carna jî saziyek ji wan bûn du sazî.
Di rewşeke wiha de di pêvajoya 10 salên dawî de kar û bar û çalakiyên rewşenbîrî di bin siya çend dezgehên rewşenbîrî de pêk tên. Ev rewş û hal di nava civakê bi giştî û di nava rewşenbîran de bû cihê arîşe û gengeşeyê û hin pirs jî derketin pêş, weke çima nivîskar û rewşenbîr di bin banê saziyekê de nayên birêxistinkirin.
Hevgirtina Rewşenbîrên Rojavayê Kurdistanê HRRK`ê destpêka vê hefteyê Dehemîn MIhrîcana Rojava ya Çand û Hunerê lidar xist.
Di bernameya roja pêşî de der barê rewşa sazî û dezgehên rewşenbîrî de panêlek hate lidar xistin, ew panêl bi bernameya mihrîcana nehemîn de bû jî lê wê çaxê ji ber êrîşên dewleta Tirk a dagirker çalakî hatin rawestandin.
Di panêlê de nûnerê 4 dezgehên rewşenbîran bi beşdaran re ev mijar û hin mijarên din ên girêdayî kar û xebatên rewşenbîrî de hatin gotûbêjkirin.
Hin nûnerên saziyan amaje bi wê yekê kirin ku pêwîste hewildanên avakirina sîwaneke rewşenbîrî û yekirina dezgeh û saziyan berdewam bibin da ku rewşenbîr karibin erk û delametên xwe pêk bînin, ji xwe her saziyekê barê xwe avête ser saziya din û got ku ew nayê yekîtiyê.
Lê hin nêrîn jî hebûn ku pêwîste kesayet û dezgehên rewşenbîrî bi dilsozî û hişmendiyeke rewşenbîrî û hevdûpejirandinê tevbigerin. Ango pêwîste erk û delametên saziyên rewşebîrî pêşxistin û geşkirina çand û wêje û kelpûr û ramanê be, her wiha birêvebirina kar û barên kesên ku bi van mijaran re mijûl in. Eger ev sazî van erkan pêk tînin û qada afrêneriyê û behremendiyê fereh dikin, asta wêje û çandê bilind dikin, wê çaxê pirbûna saziyên rewşenbîrî jî ne pirsgirêk û arîşeyeke mezin e, berovajî wê dibe ku bibe egera pêşketin û geşkirina qada çand û wêjeyê.
Nûnerên yekîtî û dezgehên rewşenbîran li xwe mukir hatin ku saziyên wan çalakiyên bi bandor û bi rêkûpêk li pêş naxin, her wiha bûne sedem ku qada rewşenbîriyê şêlo bûye û berhemên qels û lawaz derdikevin ber destê civakê.
Beşdarên Panêlê jî ji rewşa heyî ne razî ne û doza yekgirtin û lihevkirinê kirin.
Lê weke serencam têgihiştineke wiha xwe da pêş, pêwîste kesayet û dezgehên rewşenbîran erk û delametên xwe yên rewşenbîrî zanibin, û li gorî hişmendiyeke netewî û rewşenbîrî tevbigerin, bê cudahiya bîr û bawerî û alîgiriya siyasî.

# Seyid Riza; Ez bawer im ku wê Kurd û Kurdistan bi serbikevin

Beriya darvekirinê gotina Seyid Riza ya dawî ev bû: "Min nikarîbû bi derewên we re mijûl bibim, bila ev ji min re bibe derd, lê min jî, serî li ber we netewand, bila ev ji we re bibe derd."

**Birûc Resûl/Qamişlo**



Bi ser darvekirina Serokê Serhildana Dêrsimê Seyîd Riza û hevalên wî Ûşenê Seydî, Aliyê Mirzî Silî, Hesenê Îvaîmê Qijî, Hesen Axa, Findik Axa û Resik Ûşen. Seyîd Riza û hevalên wî yên di encama dadgeheke derveyî qanûnê ku di bin kontrola Îhsan Sebrî Çaglayangîl ê bi peywireke taybet di 15'ê Mijdara 1937'an de ji Enqereyê hatin şandin ve li Qada Genim a Xarpêtê hatin darvekirin, li cihekî ku kesek nizane hatin veşartin. Li gel hemû hewldanên malbat û xizmên wan dewletê cihê gorên Seyîd Riza û hevalên wî aşkera nekirin.

Piştî darvekirina Seyîd Riza û hevalên wî ji bo Dêrsimiyan rojên sirgunê dest pê kirin. Di komkujiya ku gelê Dêrsimê weke "tertele" bi nav dike, li gorî hejmarên fermî di sala 1937'an de hezar û 737, di sala 1938'an de jî 6 hezar û 868 kes hatin qetilkirin. Lê li gorî lêkolînerên dîrokê û gelek çavkaniyan di komkujiyê de bi hezaran zarok, pîr û jin nêzî 70 hezar mirov hatin qetilkirin. Dîsa bi deh hezaran kes hatin koçberkirin. Zarokên keç ên ji malbatên wan hatin stendin, radestî leşkeran hatin kirin.

Dewleta Osmaniyan piştî Komkujiya Koçgirî ji bo Dêrsimê pêvajoyeke biplan daye destpêkirin ku di çarçoveya planên hatin kirin de Seyîd Riza û kesên pêşeng di 15'ê Mijdara 1937'an de hat darvekirin. Kesên hatin qetilkirin 70 kes jî avêtin girtîgehê lê heta niha jî derbarê kesên girtî de tu agahî nehatine bi destxistin. Lê, ev rewş di sala 1937'an neqediya, di sala 1938'an vegeriya qirkirinekê.

### Polîtîkaya dewletê

Qirkirina Dêrsimê bi darvekirina Seyîd Riza û kesên pêşeng ve nehat plankirin, plan beriya darvekirinan hatibû kirin. Polîtîkayeke qirkirinê hebû û gav bi gav hat pêkanîn. Darvekirina Seyîd Riza û pêşengên din di çarçoveyekê planekê û bi gotina 'em tenê li dijî hin kesan operasyonan dikin, em tiştekî gel nakin' rêbazeke mijûlkirinê pêkanîn. Ji ber vê yekê ji destpêkê ve ser qirkirinê bû û ev plan weke polîtîkaya dewletê ket meriyetê. Di komkujiyekê de wateya kuştina temamî gelekî an jî beşeke wî nîne. Li gorî hejmarên fermî 15 hezar mirov hatin qetilkirin, lê di xebatên têkildarî Dêrsimê hatin kirin de tê payîn ku nêzî 70 hezar mirov hatine qetilkirin.

### Qirkirina çandî

Qirkirin hêj didome. Di sala 1994'an de nîviyê gundên Dêrsimê hatin şewitandin û valakirin û bidarêzorê koçberkirin çêbû. Di roja me ya îro de, hewildanên polîtîkaya bişaftinê gihiştiye asta herî jor. Yek jê xebatên li dijî baweriyê ne. Hewl tê dayîn ku baweriya Dêrsimê di nav xwezayê de dimeşîne, îro bi têkiliyên sazitiyê tê bişaftin. Li aliyê din erdnîgarî di nav bendavan de fetisî. Pêşiya ciwanan tê vekirin ku tiryakê bikarbînin û ji ser hişê xwe biçin. Ji ber vê yekê dema em lê dinêrin êdî mîrateya çandî, hişmendiya dîrokî nayê veguhestin.

### Hikûmeta xapînok!

Di sala 2011'an de serokwezîrê wê demê ya Dewleta Tirk a dagirker Recep Tayyîp Erdogan di Civîna Serokên Bajêr a Berfireh a AKP'ê de li ser qirkirina Dêrsimê wiha axivî; Rapora Dersimê ya ku ji aliyê Fermandariya Giştî ya Cendirmeyan ve hatiye amadekirin nîşan da û agahiyên li jor piştrast kir û CHP jî bi serdemê sûcdar kir. "Eger li ser navê dewletê lêborînek were xwestin, ger leyistokek wiha hebe, ez lêborîna xwe dixwazim." "Dêrsim felaketeke ku li benda ronîkirinê ye" lê; Ji bo lêborînê were dîtin heta îro tu gavên berbiçav nehatine avêtin. Lê piştî 8 rojan, ew hemû hatin darvekirin. Seyîd Riza beriya darvekirinê peyama wî a dawî ev bû: "Ez niha 75 salî me. Ezê bibim Şehîd û tevlî Şehîdên Kurdistanê bibim. Dêrsim winda kir, lê Kurd û Kurdistan wê bi ser bikevin. Ciwanên Kurd wê tola min hilînin. Bi vî awayî merivên zalim wê bimirin, merivên xerab û xapînok jî wê bimirin. "Min nikarîbû bi derewên we re mijûl bibim, bila ev ji min re bibe derd, lê min jî, serî li ber we netewand, bila ev ji we re bibe derd."

Piştî şehadeta wî saleke din berxwedan berdewam kir. Lê hovîtiya ku li Dêrsimê hat kirin, jin û zarok ji aliyê leşkerên Tirk ve hatin qetilkirin, dawî li leşkerên serhildanê anî. Li gorî raporên fermî, zêdeyî 10 hezar sivîl hatin qetilkirin û zêdetirî 11 hezar kes jî hatin koçberkirin û ev parêzgeh ji niştecihên wê hat valakirin. Gelek serhildêrên ku teslîm bûn hatin îdamkirin û jin û zarok bi saxî hatin şewitandin. Bi giştî 40 hezar Kurd hatin kuştin.

# 'Hûn nikarin çavên xwe li hember kuştina zarok û sivîlan bigrin'

**Zana Roj/ Şehba**

**Berdevka Rêxistina Stêrk a Parastin û Şopandina Mafê Zarokan li Kantona Efrîn û Şehbayê Bedîa Mislim da zanîn ku ger hêz û saziyên navnetewî dikarin çavên xwe li hemberî talankirina jêdarên jiyana gelan bigrin, lê wê nikarbin çavên xwe li hemberî qetilkirina sivîl û zarokan bigrin.**



Dagirkeriya Tirk êrişên xwe li dijî Bakur û Rojhilatê Sûriyê dewam dike, di encamê de bi dehan sivîl tên şehîdxistin. Bi van êrîşan re bi esedan komkûjî derheqê zarok û sivîlan de pêk aniye. Di nava van êrîşên dawiyê de careke din zarokên Kurd bûne qurbanî û bedelên giran hatin dayîn.

Girêdayî mijarê berdevka Rêxistina Stêrk ya Parastin û Şopandina Mafê Zarokan li Kantona Efrîn û Şehbayê Bedîa Mislim ji rojnameya me re axivî.

### `Divê êdî berteka dewletên navnetewî bê derketin`

Bedîa di destpêkê de êrîşên dagirkeriya Tirk şermezar kir û wiha pê de çû: "Dagirkeriya Tirk di sûç û kiryarên xwe yên derheqê gelê Kurd de weke her car bi hovîtiyeke mezin berdewam e. Faşîzma Tirkiyê di van êrîşên xwe yên li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê de, careke din dixwaze nasnameya xwe ya dagirkirin û qirkirina gelê Kurd tesbît bike. Di derheqê zarokên Kurd û tavahî pêkhateyên din de bi sedan komkûjî dane pêk anîn. Berteka dewletên navnetewî divê êdî li hember hovîtiya dagirkeriya Tirkiyê bê derketin. Ger dikarin çavên xwe li hember talankirin û wêrankirina binasazî û jêdarên jiyanê gelekî bigrin, lê nikarin çavên xwe li hember qetilkirina sivîl û zarokan bigrin."

### `Dîroka Tirkiyê bi komkûjiyan tijî ye`

Bedîa di berdewamiya axaftina xwe de ev ragihand: "Dîroka faşîzma Tirkiyê bi pêkanîna komkûjiyên zarokên Kurd tijî ye, di derheqê zarokên Efrînê yên ku koçberî herêma Şehbayê bûne de gelek caran komkûjî pêk anîn. Di sala 2019 an de li navçeya Til Rifetê di encama êrîşên li ser sivîlan de 8 zarok hatin şehîd xistin. Kiryarên dagirkeriya Tirkiyê heyanî vê kêliyê jî bi hedefgirtin û komkûjiyên bi vê awayî berdewam dikin. Di êrîşên 23 yê Cotmehê de bi giranî navçeya Til Rifetê bombebaran kir, careke din koçberên Efrînê û zarokên wê bûne qurbanî. Di van topbaranan de zarokê bi navê Melek Şiyar ya 5 salî şehîd bû û 4 zarok jî birîndar bûn."

### 'Zarok ji mafê xwe yê jiyankirina jiyaneke bi ewle bê par in'

Bedîa daxuyakirin ku zarokên kurd ji mafê xwe yên jiyan û zaroketiyê bê par in û wiha domand: "Ji mafê her zarokekî ye ku zaroketiya xwe bi awayekî tendurist durî şer û pevçûnan jiyan bike, her çi dibe jî lê divê mafê zarokan bê parastin û xwedî jiyaneke bi ewle bin. Zarokên Kurd bi taybet temenên gelek giran di kiryar û hovîtiya dagirkeriya Tirkiyê de dane. Zarok divê bixwînin, jiyaneke aram jiyan bikin, bi zaroketiya xwe kêfxweş bibin û pê re mezin bibin. Ger şert û merc çi dibin bila bibin lê divê zarok nebin bedel û mafê jiyanê ji wan neyê standin. Îro di herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê de li hember van êrîşan bi hezaran zarok ji mafê xwe yên xwendin û jiyankirina jiyaneke bi ewle bê par in. Bê guman ev yek jî bi zanebûn ji aliyê dijmin ve tê kirin".

### 'Pêwîste sazî û rêxistinên navnetewî bi erkê xwe rabin'

Di dawiyê de bedîa bang li Rêxistinên cîhanî ku û wiha got: "Li hember kiryarên ku derheqê zarokên herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê de têne kirin, tavahî rêxistinên û saziyê navneteweî yên ku xwe li hember parastina mafê zarokan berpisyar dibînin; erk û berpisyariyên xwe pêk bînin. Herwiha hesab ji dagirkeriya Tirk bixwazin û rê nedin qetilkirina zarokan. Li ser wê bingehê em bang li rêxistinên mirovî û yên parastina mafê zarokan yên navnetewî dikin ku bi erkên xwe rabin û bibin hêzeke heqîqî di parastina jiyan û giyana zarokan de."



# Kampa Holê; Xeteriya jinûvezindîkirina hişmendiya DAIŞ'ê

Piştî têkçûna çeteyên DAIŞ'ê, bi hezaran malabatên çeteyan li Kampa Holê hatin bicihkirin, lewra ev kamp bû kampa herî xeternak ya cîhanê. Ji ber wê QSD, YPJ û Hêzên Ewlekariya Hundrîn li dijî vê xeteriyê operasyonên elehiyê li dar dixin. Herî dawî jî di 5'ê Mijdara 2024'an pêngava bi navê 'Ewlehiya Domdar' hat lidarxistin.

**Argêş Gewda/Qamişlo**

Di sala 2019'an de piştî têkçûna çeteyên DAIŞ'ê li Baxozê li ser destê şervanên QS û YPJ'ê, Bi hezran malbatên çeteyên DAIŞ'ê ku wekî kesên herî xeternak li ser mirovahioyê ne li kampa Holê hatin bicihkirin. Tevî hewldanên Rêveberiya Xweser ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê û tevahiya bangên wê ji tevahiya welatên cîhanê re ku welatiyên xwe yên DAIŞ'î werbigrin jî, lê ev yek pêk nehat û kombûna van malbatên çeteyan di kampê de bû xeteriyeke mezin li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê û tevahiya cîhanê. Herwiha li vê kampê jimareke mezin ji welatiyên Iraqî û koçberên Sûrî jî lê bi cih dibin. Ewlehiya Kampê jî ji aliyê Ewlehiya Taybet ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê û Hêzên hevpeymanî ve tê rêvebirin. Li gorî amarên fermî jimarê kesên di kampê de, 43 hezar û 477 kes, ji wan jî 12 hezar û 101 jin û zarokên çeteên DAIŞ'ê. Ev malbatên çeteên li kampê herdem dibin cihê xeteriyê li ser tevahiya cîhanê, ji ber ew hewil didin ku hişmendiya DAIŞ'ê belav bikin û zarokên xwe li ser vê hişmendiyê mezin û perwerde dikin.

Li hemberî vê xeteriyê, Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi hêzên xwe yê ewlehî û leşkerî oprasyonên ewlehiyê li dijî vê xeteriyê li dar dixe û planên çeteên DAIŞ'ê dibe.

### Pêngavên ewlehiyê yên ku li dijî çeteyên DAIŞ'ê li kampa Holê hatine lidarxistin wiha ne:

### 1-Pêngava Mirovî û Ewlehiyê

28'ê Adarê 2021'an de hemleya destpekê ya bi navê Pêngav Mirovî û Ewlehiyê de tevlîbûna hêzên ewlehîyê destpê dike. Di vê pêngavê de ku ji aliyê Hêzên Ewlekariya Hundirîn û bi piştgiriya hêzên QSD, YPG, YPJ'ê 5 Hezar endamên ewlehiyê yê Bakur û Rojhilatê Suriyê tevlî bûn. Ev pêngave bi 2 qonaxan berdewam kir. 121 kes, di nava wan de 15 jin ku endamên rêxistina DAÎŞ'ê ne hatin girtin, her wiha 16 tûnel ku şaneyên DAÎŞ'ê ew ji bo veşartin û revê ji kampê bi kar dianîn hatin dîtin. Di heman demê de gelek alavên ku ji bo kolandina van tûnelan bi kar dianîn hatin desteserkirin. 119 kampên ku DAÎŞ'ê ji bo perwerde, dadgehên şerî, êşkence û kuştinê bi kar dianîn ji holê hatin rakirin. Her wiha 48 telefon, I pad, laptop û 2 hardên ku di têkiliyên navbera wan şaneyan de dihatin bikaranîn, hatin desteserkirin. Di encama kuştin û hewldana kontrolkirina kampê de, Hêzên Ewlekariya Hundirîn bi piştgiriya Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) û Yekîneyên Parastina Jin (YPJ) pêvajoya yekemîn a 'Pêngav Mirovî û Ewlehiyê' di 28`ê Adara 2021`an de da destpêkirin. Pêngav 5 rojan dewam kir û 2`yê Nîsanê bi dawî bû. Zêdetirî 5 hezar şervanên hêzên beşdar, tevlî pêngav bûn.

### 2-Pêngav Mirovî û Ewlehiyê (Qonaxa 2'emîn)

Ji destpêka 2022`yan ve û heta 25`ê Tebaxa 2022`yan, şaneyên DAIŞ`ê û malbatên wan 43 êriş kirin. Di wan de 44 niştecihên kampê bi kêr, tiving, debançeyên bêdeng hatin kuştin. Ji wan 14 jin û 2 jî zarok bûn. Termên wan qurbaniyan diavêtin kanalîzasyonê ji bo ku kiryarên terorî veşêrin. Her wiha çeteyên DAIŞ`ê 13 caran hewl da niştecihên kampê birevînin. Kon tevî niştecihên wê bişewitînin, alîkariyên mirovî û tenduristiyê û xizmetguzariyê jî telef bikin. Tevliheviyê çêkin û sûra li dora kampê rakin. Hêzên Ewlekariya Hundirîn bi piştgiriya QSD'ê û Koalîsyona Navneteweyî ya li dijî DAIŞ`ê pêvajoya duyemîn a pêngav di 25`ê Tebaxa 2022`yan de da destpêkirin ku 24 rojan dewam kir.





Hêzên di wê pêvajoyê de, gelek noqte û cihên çeteyên DAIŞ`ê yên ku fikrê tundraw fêr dikirin tune kir, gelek jinên DAIŞ`î yên xetere ku di wê demê de endam di nava kampê de perwerde dikirin, sûc li dijî niştecihên kampê kirine, girtin. Her wiha hêzê li dijî koma "Hisbê û Eşbalên El Xîlafe" pêngav li dar xist, gelek berpirsên wê girtin.

Di lêpirsînên wê demê de hate diyarkirin ku 3 jêderên çekan ên DAIŞ`ê hene, ya yekemîn destê hin karmendên rêxistinan tê de heye, bi taybet 'Rêxistina Bihar' ku çek û pere derbasî kampê dikirin û revandina endam û çeteyên DAIŞ`ê hêsan dikir. Jêdera duyemîn jî çekên ferdî û bombe ne ku hevserên çeteyan û zarokên wan di nav cil û bergên xwe de vedişartin dema ji Baxozê reviyan. Jêdera sêyemîn jî, DAIŞ`ê derfetên ji rêxistinan re hatine pêşkêşkirin, bi kar anîn û amûrên tûj wekî xencer, kêr, bato û amûrên îşkencekirinê çêkirin û pê niştecihên kampê tirsandin û ew neçarî radestîyê kirin. Di wê pêvajoyê de, YPJ`ê 2 jinên ciwan ên êzidî ji destê jinên DAIŞ`ê xilas kirin û birin cihekî ewle. YPJ`ê, 4 jinên ku bi zincîran hatibûn girêdan û îşkence li wan hatibû kirin, xilas kirin. Her wiha di pêvajoya duyemîn de, 226 kes hatin girtin. Di nava de 36 jin hebûn ku tev li bûyerên kuştin û tirsandinê bûbûn. 25 tunel û xendek hatin dîtin û gelek çekên navîn û sivik hatin desteserkirin.

### 3- Ewlehiya Domdar

Ji bona paqijkirina çeteyên DAIŞ'ê li kampa Holê 5'ê Mijdara 2024'an pêngavek bi navê Ewlehiya Domdar hat destpêkirin. Hêzên ewlehiyê yên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi daxuyanîyeke bi niviskî destpekirina pêngavê ragihandin. Pêngav ji aliyê Hêzên Sûriya Demokratîk HSD, Yekîneyên Parastina Jin YPJ, Hêzên Ewlekariya Hundirîn û komek ji Îstixbarata Iraqî û bi piştevaniya Hêzên Hevpeymaniya Navdewletî ya li dijî DAIŞê hate destpêkirin Ev pêngav hat payin ku di demijmira 10 rojan dê berdewam bike.

Di roja yêkemîn ya pêngavê de, Hêzên Ewlekariya Hundirîn, Yekîneyên Parastina Jin (YPJ) û Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) ragihand ku li dijî şaneyên çeteyên DAIŞ'ê odeya pêngavên hevbeş bi navê Pêngava 'Ewlehiya Domdar' li kampa Holê û dora wê daye destpêkirin, hêzên hevbeş heta niha nêzî 20 çete ji şaneyên DAIŞ'ê girtin, yek jî hat kuştin, gelek çek û cebilxane hatin desteserkirin.

Operasyona ewlehiya domdar ya ku 6'ê mehê li bajarê Holê û gundewarên wê yên aliyê Bakur û Başûr hatibû destpêkirin, îro di roja xwe ya duyemîn de didome. Di van du rojan de gelek çeteyên DAÎŞ'ê ji aliyê şervanên YPJ, QSD û Hêzên Ewlekariya Hundirîn ve hatin girtin û amûrên leşkerî hatine desteserkirin. Dema ku çeteyekî hewl da ku êrîşê li ser şervanan bike, yekser mûdaxele lê hate kirin û ev çete hate bêbandorkirin. Hêzên ku beşdarî operasyonê bûne dan diyar kirin ku hetanî ewlehiya herêmê nekeve bin kontrolê, dê operasyonên wan bidomin.

Hêzên pêngavê di roja sêyemîn de bajarê Holê û derdorên wê, beşeke mezin ji kampê paqij kirin. Di lêgerînê de 16 çeteyên şaneyên rêxistina terorîst hatin girtin û hejmareke çek, cebilxane û pêdiviyên leşkerî jî hatin desteserkirin. Her wiha di nava kampê de 2 xendeqên veşartina çek û çeteyan hatin dîtin. Di pêngava lêgerînê de, endamên şaneyên rêxistina terorîst hewl da birevin û biçin beşên din ên kampê, lê hewldanên wan hatin pûçkirin û terorîst hatin girtin.

Operasyona Ewlekariya Domdar roja 6ê Mijdarê ji aliyê Hêzên Sûriyeya Demokratîk (HSD) û Hêzên Ewlekariya Hundirîn (asayiş) ve li kampa Holê û derdora ve hat destpêkirin. Pengava 4 rojan de 73 çeteyên DAIŞ'ê û hevkarên wê hatine girtin. Armanca operasyonê, paqijkirina 100 kîlometre li kampa Holê û derdora wê (devera di navbera Hol, Til Hemîs, Hesekê, Eşîre û Şedadê de) ye.

# Şengal ji komkujiyê ber bi xweseriya demokratîk ve

Axa pîroz ku bi sedê salan bi xwîna lehengan dihat parastin di Tebaxa 2014’an de, di bin lingê qirêj de mabû. Lê şervanên rûmet û azadiyê Şingal di 13’ê Mijdara 2015’an de ji çeteyên DAIŞ’ê rizgarkirin, lê vê carê vegera Şingal bi fikir û felsefa xwe ji fermanan biparêze, serwer bû.

**Navenda Nûçeyan/Qamişlo**



Navçeya Şengalê duyemîn mezintirîn navçe li parêzgeha Mûsilê piştî Tileferê ye. Wek “Iraqa Biçûk” hatiye binavkirin, ji ber ku ol û etnîkên cuda lê dijîn. Rêjeya gelê êzidî zêdetirî ji sedî 80’ê ye, her wiha rêjeyeke kêm ereb û Tirkmen ên misilmanên sunî û şîa, Suryan û Ermen ên xiristiyan jî lê hene. Di dîrokê de gelek komkujî li ser gelê Êzidî pêk hatin e, lê heta roja îro jî, bi hemû hêz û hewldanan xwe parastin e. Herwiha yek ji fermanên dîrokî yên ku li ser gelê Şengalê pêk hatiye, komkujiya êrişên çeteyên DAIŞ’ê ye.

**Bi destekdayîna Tirkiyê DAIŞ xîlafeta xwe ragihand**

DAIŞ’ê, bi destekeke vekirî û eşkere ji dewlet Tirk û Qeterê, xîlafeta xwe li Sûrî û Iraqê îlan kir. Di 9’ê Hizîrana 2014’an de DAIŞ’ê bajarê Mûsilê yê Iraqê dagir kir, hemû baregehên xwe yên çek û cebilxaneyan li vir ava kirin û bi beşdarbûna hin komên herêmî bajar wêran kirin, kuştin û koçberkirin pêk anîn. Li aliyekî din jî dîplomatên Tirk ji bo pêkanîna projeyên xwe û rakirina astengiyên li pêşiya pêkanîna armancên wê dibûn kelem di konsolxaneyên xwe de man.

**Ji DAIŞ’ê re derfetên êrişî Şingalê hatibû dayîn!**

Piştre jî lîstoka derbaskirina 350 DAIŞ’yan bi rêya erebeyan ji xaka Tirkiyê ber bi Til Ebyedê ve dest pê kir. Li gorî plana hatibû amadekirin, 350 DAIŞ’î li şûna 50 karmendên Tirk ên li bajarê Mûsilê mabûn, hatin guhertin. Efserekî îstîxbarata Iraqê ya şaxê Mûsilê di rûniştina guhdarkirina komîteya pispor a derbarê hilweşandina Mûsilê de axivîbû û diyar kiribû ku konsolê Tirk Ozturk Yılmaz dest danîbû ser hemû biryarên têkildarî Mûsilê û destê wî di radestkirina Mûsilê ji bo DAIŞ‘ê de heye. Beriya wê ji çeteyên DAIŞ‘ê piştî reva artêşa Iraqê ji piraniya deverên Mûsilê û navendên wê, êrişî Şengalê kiribû, gelek herêmên derdora Şengalê mîna Belîc, Qaîm û piraniya sînorê di navbera Sûriye û Iraqê yê Rojava û Başûrê Şengalê de serwerî lê kiribûn. Li gorî belge û şahidan, beşek ji kesayetên girêdayî hikumet û artêşa Iraqê û Partiya Demokratîk a Kurdistanê (PDK) û hikumeta Tirk destê wan di vê komploya li dijî Şengalê de hebû.

**3’ê Tebaxê şeva pênc û dorpêça tarîtiya Şingaliyan bû**

Bi êrişkirina çeteyên DAIŞ’ê gel banga amadekariyan û pêşkêşkirina çekên giran li hêzên parastinê dikir, lê fermandarên PDK‘ê fermana bersivandina êrîşê neda û tu tevger nekir. Lewra bi hêsanî di şeva 3’yê Tebaxa 2014’an de çeteyên DAIŞ’ê ji her alî ve êrişî Şengalê kir. Erdnîgariya Şengalê kirin nava pênc û dorpêçek kûr û mezin de. Tenê yek gotin heye; ‘bazdin, birevin’, ya rastî rev û bazdan jî firsendek bû, lê ev firsend jî, ji destê wan hatibû girtin. Ji ber vê yekê gelek ji wan bêyî ku bazdin, birevin terka Şengalê bikin ketin destê çeteyên DAIŞ’ê û Şengal ket. Ne tenê Şengalê ket, gelê tê de dima jî, bi qirkirineke dijwar re rû bi rû ma.

**Îxaneteke bê sînor!**

Di dîrokê de, zilm û zordariya zîhniyeta desthilatdariya perda ewrê çarenûsa bajarê Akadê di tarîtiya şeva 3’yê Tebaxa 2014’an bi ser Şengalê de hat. Gelê Êzidî ku li Şengalê bi berbangê şiyar dibû û bîr û baweriya xwe bi tîrêjên rojê re ronî dikir, di nav lepên çeteyên DAIŞ’ê de rih dida. Axa pîroz ku bi sedê salan bi xwîna sor û spî ya lehengan dihat parastin di bin lingê qirêj de mabû. Sedema wê jî gelê Êzidî careke din bi îxaneteke mezin ya bê serûber rû bi rû ma. Gava ev kêlî tên bîra mirovan axîneke kûr tê kişandin. Sedema vê axînê jî îxanet bû, gelekî ku xwedî mîrateyek ewqasî dîrokî ya berxwêder û têkoşer ku her li beramberî êrişên bi vî awayî serîrakiriye, şer kiriye, li ber xwe daye, xwe parastiye, di nava çend saetan de bû qurban.

**Xwediyê rûmet û hêzê bûn xelasiya Êzîdiyan**

Yekîneyên Parastina Gel (YPG) û Yekîneyên Parastina Jin (YPJ) ji bo xelaskirina êzidiyên li çiyayê Şengalê korîdoreke mirovî vekir. Bi sed hezaran kes ji komkujiyan rizgar kirin û ew gihandin kamp û gundên ku Rêveberiya Xweser ji bo pêşwazîkirina wan vala kiribûn. Di vekirina vê korîdorê de 150 şervanên YPG û YPJ’ê şehîd bûn. Li aliyekî din jî li çiyayê Şengalê gerîlayan û kesên ji Şengalê yên dilxwaz, parastin dikir.

**Wêrekbûna şervanan û tirsa xiyanetkaran li Şingalê xuya bû**

Pêngava rizgarkirina bajarê Şengalê bi banga Rêber Apo di dîroka 11’ê mijdara 2015’an bi alîkariya hêzên Yekîneyên Parastina Gel (YPG), Yekîneyên Parastina Jin (YPJ), Gerîlayên HPG û bi tevlêbûna ciwanên gelê Êzidî yê welatparêz destpê kir. Ji bo rizgarkirina bajarê Şengalê, ji bo bi PDK’ê re hevbeş operasyon bê destpêkirin hewldanek ji aliyê fermandariya YBŞ’ê de hat kirin. Lê PDK’ê ji ber hebûna Tevgera Azadiyê înkar dikir, ji nedîtî dihat, qebûl nekir.

**Şengal bi lehegiya Egîdan rizgar bû**

Fermandar Egîd Civyan wiha digot, ‘Gava PDK’ê hat operasyonê, ne ku Şengalê ji DAIŞ’ê rizgar bike, weke ku hewl bide ji me rizgar bike, tevdigeriya’. Ji hevalê Egîd Civyan şahidê herî mezin wê demê bû ku bi PDK’ê re di nava danûstendinê de bû. Ev jî dide xuyakirin ku ji mayîna çeteyên DAIŞ’ê zêdetir, ji mayîna îradeya Êzidiyan nerihet dibûn. Çeteyên DAIŞ’ê 4 salan li Şengalê man, ji bo Şengal ji DAIŞ’ê bê rizgarkirin kesî hewldaneke herî biçûk raber nekir, heta ku ji aliyê hêzên HPG, YPG, keç û xortên welatparêz ên Êzîdiyan ve dest bi pêngava rizgarkirina Şengalê hat kirin. Di vê wateyê de, ji pêvajoya roja fermanê heya rizgarkirina wê bi çeteyên DAIŞ’ê re şer rojane didomand.

**Dastanên lehengî Egîd û şervan bûn ne xiyanetkar bûn**

Berî destpêkirina operasyonê HPG’ê tevlî ciwanê Êzidî ji 50 metre nêzî çeteyên DAIŞ’ê ketin çeperê şer. Şerê van çeperan li beramberî hev bûbû lîstoka kî kê têxe xefikê, bênavber didomand. Di van çeperan de gelek destanên lehengî û hunerî dihat nivîsandin. Di vê pêvajoyê de gelek çalakî û şehîd çêbûn. Di vê pêvajoyê de jî hêzên PDK’ê yê mala Mesûd Berzanî pêşmerge tinebûn. Çeteyên DAIŞ’ê di vê pêvajoya têkoşîn û berxwedanê de hêvî û îradeya xwe şikestibû, lawaz bibû. Yanî tovên rizgarkirina Şengalê di vê pêvajoyê de hatibûn reşandin. Şengal li ser vê mîrateya têkoşîn û berxwedana keç û xortên ciwanên Êzidî bi ser ket.

**13’ê Mijdarê roja tolgirtin û serkeftinê ye**

Tevî nêzîkatiyên PDK’ê jî, operasyon di fermandariya Egîd Civyan, Nûjîn û Dilşêr de, destpê kir û ev operasyon xeter bû jî, ji ber çeteyên DAIŞ li Şengalê xwedî hejmarek zêde bû û xwedî teknîkek xurt bû. Wê gelek çeper çêkiribûn. Hêzên HPG’ê tevî desteka YPG’ê, keç û xortê Êzidî bi giştî du hezar bû. Çek û cebilxana di destê wan de jî hem kêm û hem jî yê navîn bûn. Lê yên hêzên PDK’ê 7 hezar û 500 pêşmerge, 200 hammer, 100 BMB û panzêr, 30 tank û tevlî artêşekê hebûn. Di vê demê de, PDK’ê hem di aliyê hejmar de û hem jî di aliyê teknîkê de dehqat zêdeyî hêzên gerîla, YPG, YPJ, YBŞ û YJŞ bûn. Lewma tena serê xwe destpêkirina operasyon nehêsan bû. PDK’ê bawer nedikir ku hêzên HPG û YPG’ê bêyî wan dest bi operasyonê bike. Ji ber jê re bedelekî giranbûha, fedekariyek bêhempa, fedayiyek dîrokî û lehengiyek destanî ya bi biryardarî û baweriyek xurt lazim bû.

**Şingal li ser koka xwe şîn tê**

Her kêlî di dîrokê de kesayetên pêşeng derdikevin holê. Pêşengê vê pêvajoya jî di fermandariya Egîd Civyan, Dilşêr Herekol û Nûjîn de bi hestên tolgirtina jin û zarokên Êzidî bi coş û kelecanek fedayî dest bi operasyonekê kirin. Heta rizgarkirina Şengal ji çeteyên DAIŞ’ê hêzên PDK’ê nebûn. Lê piştî rizgarkirina Şengalê Mesûd Berzanî hat çiyayê Şengalê daxuyanî da û got, ‘Li Şengalê tenê hêzên pêşmerge heye, ji bo rizgarkirina Şengalê pêşmergê leheng pîroz dikim. Li vê de ji bilî ala Kurdistanê tu alê din nînin û wê nehejin’. Lê heqîqet berovajî bû, ji bo şerê derûnî û taybet bimeşînin û civakê bixapînin, deh erebê zindî û ragihandina nêzî xwe ajîte û propaganda dikirin. Di rastiyê de, li bajarê Şengalê, tenê hêzên HPG- YPG’ê û ciwanên Êzidî hebûn. Lê piştî Şengal tê rizgarkirin jinûve hêzên PDK’ê dikevin Şengalê û di raya giştî de radigihînin ku wan Şengalê rizgar kiriye.

Rêber Apo dibêje, ‘famkirina heqîqetê’ lê heqîqet ji zû de hatibû fahmkirin ku neyê pişta xwe dane Şengalê yê berê xwe dane Şengalê rizgar kirine. Ji ber şervanê berê xwe dane Şengalê şervanê heqîqetê ne, ne ji bo berjewendiyê xwe bi îddîa û biryardariya tolgirtin û rizgarkirina Şengalê çûbûn. Ji ber ew sondxwariyê tolgirtina gelê Êzidî bûn. Di dil û mejiyê wan de, di xeyalê wan de, tenê rizgarkirin hebû. Ew jî di roja 13’ê Mijdara sala 2017’an de Şengal bi temamî ji destê DAIŞ’ê hat rizgarkirin. Lê vê carê vegera Şengalê pir cûda bû, vegereke bi fikir û felsefa xwe ji fermanan biparêze, serwer bû. Ji xwe hedefa vê fermanê hebûna Şengalê ji kok de ji holê rakirin û qirkirin bû. Lê îro Şengal bi fikir û felsefa baweriya Êzdiyatî li ser koka xwe şîn dibe.



## Hilbijartinên Amerîka zêde bandorê li herêmê nake!

**Dilyar Cizîrî**

Çend roj berê hilbijartinên Serokatiyê yên Amerîka hatin lidarxistin. Di encamê de namzetê Partiya Cemhûrî Doland Turam ku di sala 2019’an de Serokê Amerîka bû, bi ser ket. Ji ber di sala 2019’an de Turamp hêzên xwe ji gelek bargehên Amerîka yên li Bakur û Rojhilatê Sûriyê kişand û rê da dewleta Tirk ku êrişî herêmê bike. Encamên hilbijartinên Amerîka û serktina Turamp di nava gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê wekî rojevekî serke, hate nirxanin.

Her aliyekî li gorî şîroveyên xwe li ser mijarê xist. Dewleta Tirk û hemû hevakarên wê yên wekî PDK’ê û ENKS’ê mijar pir zêde kirin rojev. Dema mirov li şîrove û nûçeyên wan meyze dike, mirov dibêje qey wa Amerîka hêzên xwe vedikişîne û wa dê Erdogan êrişî herêmê bike. Di nêrîna min de ew daxuyaniyên dewleta Tirk û hin şîroveyên bê bingeh ku hatin kirin, di çarçoveya şerê taybet de hatin pêşxistin. Ragihandina PDK’ê û ENKS’ê jî wekî alavekî di çavtirsandina gelê herêmê de hate bikaranîn. Bi van siyasetan dixwazin pêla koçberiya ji herêmê ku heye, hîn zêdetir bibe. Di nêrîna wan de bi hatina Turamp re xelas ezmûna dagirkirina Serêkaniyê û Girê Spî wê dûbare bibe.

Ez di vir de nabêjim ne mumkine Turamp hêzên xwe yên li Bakur û Rojhilatê Sûriyê venakişîne. Dibe piştî dest bi erka xwe bike, hêzên xwe vekişîne û heta dibe bi dewleta Tirk re itîfaq bike, di rewşa tevlihev a di herêmê de her tişt mumkine.

Lê tişta ne mumkin ewe ku gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê ku bi têkoşîna xwe ya hevpar beriya Amerîka were herêmê şoreşa xwe destpê kir. Gavên mezin avêtin û sîstema xwe ya demokratîk ava kir, gavan paş de bavêje. Rêveberiya Xweser beriya wan hate avakirin. Şerê DAIŞ,ê El-Nusra û çeteyên din ên dewleta Tirk beriya hatina Koalisyona Navdewletî were herêmê hate kirin. Xelkê herêmê tu carî çarenûsa xwe bi tu hêzekî derve girênedane. Neha jî wê çarenûsa xwe bi tu aliyan ve girê nedin.

Niha bi hatina Turamp a serokatiya Amerîka jî wê gelê herêmê ne li bende be, hêzên xwe vekişîne yan na. Ema heger mirov li rewşa li Rojhilata Navîn di aliyê jiyosyasî ve meze bike, Amerîka bêyî alîgirekî xwe yê bi hez di herêmê de misoger bike, ne mumkine navendên xwe yên li Bakur Rojhilatê Sûriyê vala bike. Turamp têkoşîna li dijî Îranê yek ji xalên sereke yên hilbijartinan xist rojevê. Ji ber ne mumkine Turamp wiha meydanê ji Îranê re vala bike. Dibe hinek bêjin mane dewleta Tirk hevkarê Amerîka ye û dê rola têkoşîna li dijî Îranê bimeşîne. Na, Dewleta Tirk mane duh di toreya 22’an a komxebata Astana bi Îran û Rûsiya re civiya. Bi wate baweriya Amerîka bi Erdogan wê ne wekî sala 2019’an be.

Li aliyê din şerê Îsraîl li Xeza û Lubnanê û hewldanên tunekirina Hemas û Huzib El-Alh di herêmê de derketine asta herî jor. Ev ji bilî tekoşîna li dijî DAIŞ’ê û metirsîna ji nû ve belavbûna wê di herêmê de, bi taybet ku di Koalîsyona li dijî DAIŞ’ê ne tenê Amerîka ye, bi dehan welatên din pê ve eleqedar e.



# Desthilata AKP-MHP’ê dixwaze bi qirkirina siyasî îradeya gel desteser bike

Parlementera DEM Partî ya Mêrdînê Salîha Aydenîz diyar kir ku rêbazê bikaranîna qeyûman binpêkirina mafên hiqûqî ye û wiha got: “Bi tayînkirina qeyûman neçareserkirina pirsgirêka kurd kûr û dûr dikin.”

**Amara Baran/Qamişlo**



Desthilata AKP-MHP ‘ê qeyûm avêtin li ser Şaredarîya Bajarê Mezin a Mêrdînê û şaredarîyên Êlih û Xelfetîyê. Bi darê zorê ji kar avêtina şaredarên hilbijartî û danîna qeymeqan li şûna wan, nîşana rejîmeke zordar e ku guh nade îradeya gel. Ew dixwezin bi reya qeyûman îradeya gel kelepçe bikin û tune bikin.

Di vê çarçoveyê de parlementera DEM Partî ya Mêrdînê Salîhe Aydenîz ji rojnameya me re axivî.

**‘Qeyûm binpêkirina mafên hiqûqî ye’**

Salihe Aydenîz di destpêka axaftina xwe de bal kişand ser polîtîkaya qeyûman û wiha got: “Desthilatdariya AKP-MHP’ê ji sala 2016’an ve polîtîkaya qeyûman xistiye dewrê û dixwaze vê polîtîkaya xwe bidomîne. Li ser vê domandina polîtîkaya qeyûman carek din awir zivirîn ser pêkanînên qeyûman. Dîsa li ser daxwaz û fermana desthilatdariyê qeyûm danîn ser Şaredariya Bajarê Mezin a Mêrdînê, Şaredariya Êlihê û Şaredariya Xelfetiyê. Qeyûm tê wateya desteserkirina îradeya gel. Rêbaza bikaranîna qeyûm binpêkirina mafê hiqûqî ye. Hiqûqê binpê kirin e. Bi tayînkirina qeyûman neçareserkirina pirsgirêka kurd kûr û dûr dikin. Ev nayê qebûlkirin. Em dibînin ku neçareserkirina pirsgirêka kurd çi ye. Dij derketina qeyûm daxwaza çareseriya pirsgirêka kurd e. DEM Partî ji bo her kesî çareseriya demokratîk dixwaze. Em ji bo demokrasiyê û aştiyê dixebitin û têdikoşin. Aştî sedema hebûna me ye. Gelê kurd teslîmî qeyûm nebû û wê qet jî nebe. Êdî bes e we xwe xapand, gelê kurd wê serê xwe netewîne.”

**‘Dewleta Tirk bi darê zorê îradeya gel desteser dike’**

Salîhe da zanîn ku ev cara sêyemîne ku gel hilbijerên xwe yên şarederiyan bi aweyek demokrasî dike û wiha domand: “Dewleta Tirk û desthilata AKP- MHP’ê bi sindoqan nikarin li Kurdistanê meşruyetê pêk bînin, bi darê zorê û bi zagonên xwe îradeya gele kurd xesp dike. Dema ku îradeya gele kurd xesp dikin hertim behsa hiqûq û darizandinê dikin. Ji bo ku ji aliye hiqûqî ve qeyûm bavêjin ser şarederiyan gotineke şênber nehatiye kirin, ev jî nîşan dide ku derbeyek siyasî ye. Niha li Tirkiyê ti wateya sandoqan nemaye.”

**‘Qeyûm nenaskirina sendoq û îradeya gel e’**

Salîhe wiha domkir”Desthilata AKP’ê 8 salin bi qayûman rantekî mezin pêk tînin walî û qaymaqam bi rêya qeyûman dixwazin îradeya gele kurd bişkînin. Li tirkiyê di rapora saziya sayîştay de jî ev eşkere bû di hilbijartinê heremê yen 2024 an de îktîdara AKP’ê hijmareke mezin hundakir û şarederî ji destê wan çû, ji bo ku vî ranta xwe bi derdorê xwe berdevam bike qayûm avêt mesela qeyûmê mesala ne naskirina sandoq û îrada gele. Lazime gele me di tekoşîn u berxwedana xwe xurtir bikin ne tene gelê kurd lazime hemû gele tirkiyê jî li hember polîtîkayên dewleta tirk dengê xwe bilind bike ji bo îktîdara ku meşruhiyeta wî nemaye were hilweşandin.

**‘Li Tirkiyê hiqûq nemaye’**

Salîhe wiha anî ziman û got “ Te gotin ku li tirkiyê hiqûq heye mixabin îro ji bo gelê kurd tevahî hiqûq nemaye lê belê li hember gelê kurd bi awayek zelal hiqûqa kolonyalîzmê te karanîn li ser darizandinê qayûm avêtin vî nîşandide, pir rihet ji xwe re gerekçeyan çêdikin û navî dibêjin hiqûq û qanûn li ser vî qanûnê polîtîkayên kolonyalîzmê didomînin, li bakur şerê taybet şewitandina daran kuştin û tecawûzên jinan nêzîkatiya li hemberê ciwan û jinên kurd û polîtîkayên şerê taybet vana hemû bi kîjan hiqûqê li hember kurdan pêk tînin ev pir zelal dide nîşandan. Dewleta tirk li hemberê gelê kurd di qanûna kolanyalîzmê de bi israre.”

**‘Gelê kurd di tekoşîna xwe de bi israr e’**

Salîhe di dawiya axaftin xwe de wiha got “Ji ber ku gel xwedî li vîna xwe derdikeve û li ser pêyan e îktîdar winda dikin. Ev zexta qeyûm ne tenê li ser gelê kurd, li ser hemû Tirkiyeyê hatiye kirin û êrîşek li dijî pergala me ya hevserokatiyê ye jî. Pergala hevserokatiyê hebûna jiyanê bi xwe ye. Desthilatên heyî bi tunehesibandina hevserokatiyê di rastiyê de jiyanê bi xwe tunedihesibîne. Em tayînkirina qeyûman nasnakin û em ê di hemû qadên jiyanê de li dijî vê yekê têbikoşin. Li hemberê van polîtîkayên ne naskirina gele kurd û îradeya gelê kurd û ne wekheviyê lazime gelê kurd û gelê tirkiyê bi hevdûre tekoşîna xwe mezin bike û vî îktîdarê û sîstema sedsala a dewletê wî aniye asta xilasbuyînê, pêwîstî bi vegûherandina sîstema sedsalî heye mesela me mesala sîtemêye sîstema îtîhat terakî yê ye di sedsaliya cûmhuriyetê de lazime cumhuriyet bi demokrasiye re were ba hevdû û li gor vî zagon werin derxistin.

## Trump ji bona Erdogan derîyê şer e...



**Zekî Bedran**

Demê di kampanyaya hilbijartinan de, Trump got ezê şer bisekinînim. Ev ji ber ku piştgiriya raya giştî bigire û ji bona wek serokê DYA bê hilbijartin, encamekê plansazîya hilbijartinê bû. Ev pêşdîtin hundirê wê çiqas dagirtiyê û çiqas rastîyekî pratîkî ye, miro demên pêş meyze bike û bibîn e. Lê, ji derveyî ji Trump zêdetir yekê din jî hezdikir Trump bê hilbijartin. Ev kes jî Erdogan bû. Erdogan ev şerên ku destpêkiriye, ne bendê bû Trump dawî bike. Berovajîyê wê ev dagirkirinên ku berê pêk anî bû, demê desthilatdariya Trump de û bi piştgriya wî pêkanî. Dîsa wê hêvîyê da bû ku ji bona qadên dagirkeriyê yên nû derî jêre bê vekirin bû.

Erdogan wisa dide xuyakirin ku aşitîxwaz e. Dibêje bila cîhan bila nav aramiyê de jiyan bike. Dixwaze şerê Israil û Filistîn Rûsya û Ukranya xilas bibe. Lê, erê lê yek wê jî heye, bila ev şer xilas bibin lê ji bona ez Kurdan têkbibim pêşîya min vekin. Kurdan girêdayî wê cîhanê nabîne. Ji bona Kurdan dîrokê de bide bîrkirin ji gelê Kurd peywendiyekî mirovî û aşitîyane na qet nafikire.

Serokê DYA yê berê John Biden zêde guh neda Erdogan. Di dema erka xwe de ew venexwandibû Amerîkayê. Li gel NATO’yê piştgirî dan şerê îmhayê yê li dijî PKK’ê. Lê bi tevahî piştgirî nedan dagirkirina Rojava. Bombardûmana Erdogan a li ser qadên jiyanê, qetilkirin û qirkirina sivîlên li Rojava şermezar kirin û li dijî wan rawestiyan. Ji aliyekê ve hilbijartinên ku Kurdan bi xwe ve girêbidin, ji aliyê din ve jî hevsengiya têkiliyên xwe yên bi Tirkiyeyê re hilbijartin.

Dema ku Erdogan ji ber hilbijartina Trump pîroz kir jî, kurdan li ser YPG’ê dest bi hevdîtinan kirin. Dibêje, bila şerê cîhanê biqede, lê bila şerê li dijî kurdan bidome da ku qet ronahiya rojê nebînin. Piştgiriyê bidin operasyonên min ên îmhayê yên li dijî Kurdan. Karê min li ser tiştên ku ez bi tenê nikarim bikim hêsantir bike. Dibêje polîtîkayên min ên komkujî û qirkirina bişaftinî dipejirînin.

Piştî hilbijartina Trump, Erdogan di axaftina xwe ya 10’ê Mijdarê de bi dengekî bilind diyar kiribû ku ew ê herêmên mayî yên Bakur û Rojhilatê Sûriyê dagir bikin û dawî li hebûna kurdan bînin. Wî bal kişand ser wê yekê ku Tirkiye dê operasyonên xwe yên navdewletî ji bo parastina sînorên xwe û xurtkirina ewlehiya xwe berdewam bike. Em ê ti carî destûrê nedin ku li Başûrê sînorên me welatek din ava bibe. “Em ê herêmên li derveyî dagirkeriyê mane dagir bikin û herêma bi ewle temam bikin.” Beriya niha jî hêzeke mezin li Başûrê Kurdistanê ku di nav sînorên herêma ewlekariya Iraqê de ye, bi cih kirine û êrîşên wan berdewam dikin.

Herêma ku Erdogan jê re dibêje korîdora terorê û herêma terorê ew herêma ku Kurd lê dijîn e. Herêmên ku Kurd tê de jiyan dikin, bi giştî li erdnîgariya ku sînorê Tirkiyeyê ye cih digirin. Armanca Tirkiyê ew e ku bi derxistina kurdan ji vê herêmê dawî li hebûna Rojavayê Kurdistanê bîne. Yanî bi qirkirinê û bişaftinê dixwazin van herêman bê Kurd bihêlin. Kiryarên ku li Efrîn û Serêkaniyê pêk anî ye, dixwaze li vir jî bike. Efrîn di vî warî de mînakeke berbiçav e. Bi veguheztina hejmarek ji Ereb û derdorên din ber bi van herêmên ku piraniya niştecîhên wan Kurd bûn, pêkhateya demografîk guhert. Li Serêkaniyê Kurd nehiştin. Li cihên din jî kurdên ku hejmara wan hindik maye, wek girtiyan tên dîtin. Zimanê Erdogan jehrê li Kurdan belav dike. Ziman û hişmendiyekî li ser tundî û îmhayê hatiye avakirin. Dibêje divê ji bo pirsgirêk û şerên li erdnîgariyên dûr bi danûstandinên dîplomatîk û rêbazên siyasî çareserî bên dîtin. Lê dema mijar dibe Kurd ji bilî terorê tiştekî din nabêje. Pirsgirêka dîrokî ya 200 salî di têgeha terorîzmê de pênase dike. Çawa ku li ser Tirkiyeyê kirin dixwazin vê li cîhanê jî ferz bikin. Li cîhanê bi tu kesî re qala pirsgirêka Kurd nakin. Naxwazin bibe rojev jî. Ligel ku bi 10 hezaran mirovan jiyana xwe ji dest dan, bi hezaran gund hatin şewitandin û bi milyonan kes ji warên wan hatin qewitandin jî ev rastî tên înkarkirin. Dibêjin em tenê li dijî terorê şer dikin.

Eşkere ye ku Erdogan wê ji guhertina rêveberiya DYA’yê sûd werbigire û êrîşên xwe yên li ser Rojava zêdetir bike. Demek dirêj e amadekariya şer dikin. Li herêmên dagirkirî bi deh hezaran hêzên çekdar perwerde dikin û li gorî fermana şer bi cih dikin. Herî dawî serokên van çeteyan birin Hewlêrê. Bi Barzanîyan re hevdîtinên xwe kirin. Ji ber ku yek ji stûnên tasfiyekirina Rojava Barzanî ne. Ji bo ku Rojava were dorpêçkirin, xeniqandin û ji gelek aliyan ve êrîş bê kirin, divê Bashûr jî were aktîfkirin.

Niha ji bilî şerê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê ti rêyeke din nîne. Dewleta Tirk ji bo şer dest bi propagandaya şer kiriye û raya giştî jê re amade bike. Divê gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê jî li gorî van rastiyan amadekariyên xwe bikin. Pêwîste bi berdewamî raya giştî ya hundir û derve agahdar bike. Divê xebatên dîplomatîk di asta seferberiyê de bên meşandin. Divê Rêveberiya Xweser li gorî rastiya şer xwe amade bike û şêwazekî lezgîn xebatên xwe bidomîne.



## Galegalên binî pûç

**Farûk Sakik**

Piştî çalakiya Enqerê (PKK wek çalakiyek ‘fedayî’ bi nav dike), hin nîqaşan dest pê kir. Arguman û derewên dijmin di nav civakê de belav bûn. Digotin, PKK alîgirê çareseriyê nîne. PKK’ê hewldanên çareseriya doza Kurdistan berteraf kir. Rêveberên PKK’ê ji bo aqûbet û paşeroja xwe naxwazin pêvajoya aştiyê dest pê bike.

Em ê behsa biryara Rêber Apo bi serê xwe wek biryara PKK ye, nekin. Hewldan û fedekariyên wî yên aştiyê tên zanîn. Em ê behsa pêvajoyek ji bo çareseriyê tune ye û hên jî dest pê nekiriye jî, nekin. Em ê behsa jiyana 3 rêveberên PKK’ê bikin. Cemîl Bayik, Duran Kalkan û Mustafa Karasu. Cemîl Bayik, berê ku bibe ‘Cûma’, li Enqerê Fakulteya Edebiyatê de dixwend. Rojek di çalakiyekê de Kemal Pîr ew nas kir û anî bi Rêber Apo re da nasandin. Paşeroja xwe, mamostetiya xwe, muhendisiya xwe da aliyekê û dest bi têkoşîna doza Kurdistan kir. Dûran Kalkan, berî ku bibe ‘Abbas’, li zanîngeha Enqerê Fakulteya Fenê dixwend. Hevalê Hakî Karer bû. Rojek Hakî Karer ew anî û bi Rêber Apo da nasandin. Dûran Kalkan ê bi eslê xwe Tirk bû ewroj biryar da û di doza Kurdistan de wek neferek dest bi xebatan kir. Wî jî paşeroja xwe û jiyana xwe ya taybet da aliyekê. Mustafa Karasu, berî ku bibe ‘Karasû’’ li Enqerê fakulteya siyasalê dixwend. Di destpêkê de nêrînên wî yên cuda hebûn û bi israr tevlî koma Apoyiyan nedibû. Piştî demek, bi Rêber Apo re hevdîtinek pêk anî. Rêber Apo bi Karasû re 5 deqe diaxive û dibêje; “Tu şoreşger î. Tu nêrînên me di cîh de dibînî yan na? Rewşa gelê kurd jî li holê ye. Berpirsyariyên te jî hene Tu yê tevlî vê tevgerê bibî yan na?” Lê êdî Karasû firset nedî ku bibêja na. Qebûl kir û tevlî xebatên komê bû. Jiyana piştî zanîngehê ewroj li pey xwe hişt û dest bi rêwîtiya azadiya Kurdistan kir.

Ev 3 kes ji jiyaneke wiha tên û bixwestina wê di jiyana xwe de bibûna xwediyê gelek derfetan. Lê wan jiyana bi zehmet bijartin. Azadiya gelan tercih kirin. Tu bendewariyek ji bo jiyana xwe ya şexsî nexwestin. Ev 3 kes bi vê jiyana xwe ya fedaî di şertên dijwar de dijîn. Êdî emrê wan jî derbas dibe. Ew ji me tevan zêdetir dixwazin, Kurdistan azad be. Duh çawa jiyana xwe feda kirbûn, îro jî bi hêsanî dikarin fizîkî jî xwe feda bikin. Çawa dibe ku ev azadiya gelan an jî çareseriya doza Kurdistan were rojevê û ew jî terk bikin. Ev ne mimkun e. Çalakiya Enqerê rêbazek azadkirina Kurdistanê ye.

Ka îtiraf bikin, dema êrîşên dijmin çêdibûn, dema komkujî pêk dihatin, li Kurdan zilm dihat kirin, we nedigot “çima aliyê metrepolan çalakî nayên lidarxistin. We nedigot “çima PKK’ê hêza xwe naxe pratîkê”. Çalakiya Enqerê bersiva van pirsên we bûn. Lê dijmin berê we da aliyek din. Dijminê di dilê xwe de derbxwarî, çalakî manîpule kir û kir parçeyek şerê taybet. Xwest tevgera azadiyê di çavên civakê de reş bike. Di hedefa gotinên Bahçelî de tunekirina tevgera azadiyê hebû. Tevgera azadiyê bi vê çalakiyê xwe parast. Planên wan ên tarî berteref kirin.

Ji xwe rêveberên PKK’ê di daxuyaniyên xwe de armanca çalakiyê bi detay anîbûn ziman. Min xwest, balê bikişînim li ser axaftinên ku ji bo rayedarên PKK’ê dibêjin; “ew ji bo paşeroja xwe naxwazin doza Kurdistan çareser bibe” bidim. Ev 3 kes bi tecrubeyên xwe yên salan, biryarên baş didin. Ji wan bawer bikin.